

ZAROKEK

gelek ziman



PÎROZ BE

Zaroka te yek ji bi milyonan zarokên ku di malbatên pîr zimanî de mezin dibe ye.

BI BEBEKA XWE RE BI ZIMANÊ KU JI TE RE HÊJATIRÎN TIŞT E SOHBET BIK Û BISTIRÊ.

- Mîrov zimanê dayka xwe çiqasî baş zanibe ewqasî mecalên ku mîrov fêrî zimanekî din bibe baştir dibin.
- Mîrov çiqas zêde bi zimanekî bi axive û lê guhdarî bike ewqasî di zimên de jêhatî dibe.
- Bi zarokên din re leyîstin hem hevahengî û hem jî şîyana zarokê ya zimên pêşde dibe. Ji lewra jî baş e ku ew û zarokên di temenê xwe de hevdû bibînin.

FÊRBÛNA ZIMÊN ZÛ DEST PÊ DIKE

- Hê di zikê dayka xwe de zarok fêrî naskirina zimanê dayka xwe dibe. Lêkolînan nîşan daye ku hê zarok çar rojî ye dema ku dibihîse jinikek din zimanê dayka wê diaxive û ku eynî jî zimanekî din di axive, ew zarok zimanê dayka xwe berî zimanê din tercîh dike.
- Dengê hemû zimanên ku li dinyayê hene di nav gixegixa zaroka berşîr de hene lê bi tenê dengê zimanên ku li dora wê tînin axaftin pê re dimîne.

- Zarok di ro mehiya xwe de bi xwe re gixegixên dirêj yê bi rîtm û bi şidandin ku nêzîkî zimanê li hawîrdora xwe dibihîse "diaxive".

ÇAWA ZAROK DIBIN PIRZIMANÎ?

- Ji ber ku wê zimanê swêdî di dibistanê de û di nav hevalan de ji zaroka te re bibe zimanê serdest girîng e ku zarok di gelek babetan de para xwe ji zimanê malbatê bistîne.
- Zarok bi swêdî bersivê bide jî tu berdewam bik bi zimanê dayka xwe bi axiv. Zaroka xwe teşwîq bik da ku zimanê ku hûn bi hev re diaxivin bikar bîne.
- Nîşanî zarokê bid ku tu bi zimanê xwe serbilind î herçiqas ku kesên din bi wî zimanî na axivin jî.
- Heger tu û hevjinê xwe ne swêdî bin jî muhîm e ku hûn herdû jî bi erênî li fêrbûna zarokê ya bi zimanê swêdî binêrin. Heger zimanê we ne wekhev be jî muhîm e ku hûn qîmet bidin zimanê hev.

PÊŞKETINA BI PIRZIMANÎ

- Zarokên ku bi gelek zimanan re mezin dibin wek zarokên

yekzimanî di eynî temenî de dest bi axaftinê dikin.

- Wek prensîb pêşveçûneke bi pîrzimanî û ya zarokeke yekzimanî wek hevdu pêşde diçin.
- Zarokên bi pîrziman zû fêrî jihev cihêkirina zimanên xwe dibin û gelek caran ji zarokên yekzimanî zûtir di zimên de şareza dibin.
- Zimanên ku zarok dizane wê di peryodên cûda yên jiyane de bîn bikar anîn.

Heger mirov zimanê derodorê zanibe mirov li wê derê baş dixebite/ serketî dibe.

Heger derûdor pîrzimanî be zarok bi hewceyî hemû zimanên xwe ye.

Pêwîstiya nêzîkbûna zarokê bi mirovên ku ew nêzîkî wan e û ji wan hez dike jê re tayînkere û bê wê ew zarok kîjan zimanî yan jî zimanan ji xwe re fêr bibe.

Awayê herî baş ji bo ku zaroka te fêrî zimanê te bibe, divê bi kêf û daxwazî be. Ji bo ku tu intresa wî ya fêrbûna ziman xurt bikî jê re bistirê, pê re bileyiz û jê re çirokan bêj. Û dema ku

zarok mezin bû – bihev re bi axiwînin!
Li pirtûkxanê pirtûkên zaroka bi gelek zimanan hene.

TU TIŞT NIKARE CÎHÊ BIHEVRE SUHBETKIRINÊ BIGIRE

Baştirîn rê ji bo fêrbûna zimanekî -çî zimanek be çî du ziman bin- divê bi ahengiya di nav we de yan jî kesekî din yê girîng de be. Radyo, televîzyon û vîdeo ji bi hêdî hêdî dikarin bibin alîkarê pêşdeçûna zimanê zaroka te. Lê tu tişt nikare cîhê bihev re sohbetkirinê bigire!

DIVÊ MIROV KENGÎ TÊKILIYÊ BI LOGOPED (PISPORÊ DENG Û AXAFTINÊ) RE DAYNE?

- Dema ku pêşdeçûna zimanê zaroka te ji ya xuşk û birayên wê û zarokên din ku di eynî temenî û eynî rewşê da ne bi hêdîtir diçe.
- Heger zaroka te salûnîvek-du salan li hawîrdorek ku bi swêdî diaxivin mabe (pêşdibista, dayîn) lê hîn jî bi qasî ku mirov jê hêvî dike bi swêdî fêrî zimanê rojane ne bûbe.

Wê çaxê divê tu tîkiliyê bi hemşîreya-BVC (Navenda Lênêrîna Zarokan) yan jî bi Logoped re daynî.

© Monica Westerlund, docent, leg. logoped



Språknätet (tora zimên) hevkarîyek navbera Navenda lînêrîna zarokan (barnavårdscentral-BVC), kîtebxane, pêşdibistana vekirî û logopeda li parêzgeha Uppsalayê ye.

Li ser weba Språknätet zêdetir malûmat û pêşniyazên ji bo pêşxistina zimanê zarokan heye: www.spraknatet.se